Helbest di navbera rastiyê û arezû de

Dilşa Yûsûf

Helbest, di gava xwe ya yekem de gava wek hunerekî ji hêla mirov de hat afirandin bas li karesatên xwezayî, pêwendiya xwedawendan bi mirovên asayî re, gera mirova li dûv pîvanên xwedawendiyê û sermedî dijîn, xiyanet, dolabgeriya mirovên bi hêz beramber yên bê hêz, şerê di navbera xwedawendên mê û nêr, çêj ji jiyanê girtin û hwd.

Ji xwe helbest weha dihê nasandin, yanî gerekiya helbest dihê girêdan bi rastiya derketina çîn û qatan û destpêkirina çewsandina civakî di nava civaka mirovatiyê ya seretayî de, bi wata: "her ku nabên di nava rastiyê û arzûyên mirov de kûr û fireh bû, bi qasî wê jî xem û derd û janên mirovan jî zêde bûn, êdî gihaştina mirad û bi destxistina awat û pêdiviyan, têkoşîn û ked û berxwedanî dixwest", ji ber wê helbest wek hunereke afirandî, giringiya xwe disepand li ser dîroka mirovatiyê ji destpêka wê de heta evroj.

HELBEST

Di vê serdema dawî de helbest her diçe nivîskar û xwendevanênên wî kêm dibin. Ji ber ku mirovên vê serdemê bi sedema mercên guncaw û refaha civakî û piştgîriya yasayan ji mafê mirov re û pêşketina teknolojiya, komek mezin ji awat u arzûyên mirovan bi cih dihên, yanî mabên di navbera rastiyê û arzû de her diçe kêm û kurt dibe. Ji ber wê êdî helbest giringiya xwe ji dest dide, wek fakterekî alîkar ji mirovan re ku di riya wê re keldûman û hesret û arzûyên xweyî veşartî û bicihnehatî derbibirin.

Ji ber van sedeman em dibînin di civakên pêşketî de, ku heta radeyek mezin, pêdiviyên serekî ji bo jiyana mirovan hatine bicihkirin, yasa û desthilatdarî tenê ji bo vê hene ku nirxê jiyana mirovan bilind rabigrin û mafên wan dabîn bikin, êdî livbaziya afirandina helbestan, belku ya tevayî cûrên hunerên din jî kêm dibe û berew lawazbûn ê diçe.

Belku, heger heta niha di civakên paşdemayî de wek civakên me, taze helbest û cûrên hunerê yên din geşe dikin, ji ber sedemên ku hêşta em di qonaxek gelek paşdeketî de jiyan dikin beramber civatên din. Civatên me bi her awayî, di nava bazinekî teng , pêkhatî ji (qedexekirinê) dijî. Qedexekirina raman, derbirîn, jiyan û hizirkirinê. Ne tenê weha belê pîvanên nirxdayina mirovan û jiyana wan gelek li paşin û hêşta nabênek berfireh heye di navbera rastiyê û arzû û daxwazî û awatên mirovan de. Ji xwe derbasbûna teknîkê û bi taybet têlevîzyon wek amûrekî serdemî di nava civakên paşdemayî de gelek pîvan serûbinî hev kiriye û têk daye, ji ber pirogramên xwe yê pakêtkiri, ku ji derve de dihêne sepandin ser civaka me û her diçe hîna bêtir rewşa civakî aloztir dike û wê biyanî dike ji rastiyên wê.

Hemî cûreyên huner û wek wan jî helbest, li dûv pêdiviyan civakan derketine holê. Ji ber wê mirov nikare wan ji civakê dabibire. Yanî çemka huner bo hunere, helbest bo helbest e, li gor ew şîrova me kirî, ne raste. Demek dirêj ev pirsgirêka kete ber guftûgokirinê de. Û her gav çemka ku helbest bo gel û civakê ye bi ser dikeve.

Ez dixwazim bînim ser xwe wek nimûne, di qonaxên jiyana xwe de û li gora pîvana kûraniya hestkirina min bi jan

HELBEST

û hesret û çewsandina xwe ji hêla civakê de, ewqas jî helbest karîger dibû wek amûrekî derbirînê û tekoşînî bo destxistina awatên xwe, carekê wek mirov û careke din wek jin. Her ku hêza min ya biryardayinê zêde dibû û ez dibûm xwediya hêzê û îradê û hişmendiyê û her çende min awatên xwe bi dest dihanî, ewqas pêdivî bi nivîsîna helbest lawaz dibû li ba min. Û niha ji hemû qonaxên jiyana xwe , kêmtir helbest dinivîsim, ne ji ber ku nirxê helbest wek faktorekî giring bo avakirina civakan û roldîtin di guhertina pîvanên wê de kêm dibînm, na belku ji ber ku hêza çerserkirinê û bi destxistina îrada azad û hêzek hişmendiyê yê bilind min bi destxistiye, ta radeyekê ku tiştê dixwazim û arzû dikim pêk dihînim, bêyî ku tu kes yan civak disepîne li ser min. Û ez bi xwe bawer nakim bi atmosferê- ango (tuqûs- bi erebî) helbest nivîsînê hebe. Ji ber kû helbest nivîsîn li ba min komcivîna komek ji raman û hest û nest e, vehûnandine di gel mercên jiyana min û neynika nerînên min û hizira min e, di nava xwe de tevdigerin, dû cemserên wan yên sar û germ hene, gava li hev dikevin, wek du ewrên sar û germ kontak dibin, birûsk vedidin û gurmînî bi wan dikeve û ji nişkave baran yan teyrok yan jî berf dibare. Ez bi giştî rewşa helbestnivîsînê li ba xwe weha şîrove dikim.

Ji ber wê hûn dikarên di helbestên min de, min bi xwe bibinin, ji kîjan koşê li bûyeran û jiyanê temaşa dikim, Çawa tiştan bi nav dikim, Pîvanên min çine, Asta hizirkirina min çiye? Belê dixwazim tiştekî din ya giring li vir teqez bikim, ku tu caran helbest nikariye tiştên paş hizirkirina merov bi tevayî darêje, yanî bi wata ku merov çend hosta be di vehûnana helbestê de, her hindek paşgo dimînin, helbest nikare bighê koka wan. Belkî ji ber vêya ku helbest bi xwe(kêlîka tengezariyê) ye di merov de û her dixwaze bi şêwazên here ciwan xwe bide nîşandan. Ji ber wê ye ku dê her helbest bimîne

HELBEST